

PIRS

Kovareke Rewşenbîrî û Serbixwe ye.

Pêşgotin :	Rênivîsa Kurmancî	2
Gotar :		
	- Pelek kesk ji dareke Efrînê weşiya Dr . Ebdilmecît Şêxo . . .	12
Lêkolîn :		
	- Em zimanê Kurdî binasin . Eniftûtuya Kurdî ya stenbolê	3
	- Heyam li navça Çiyayê Kurmênc . Dr . Mihemed . E . Elî	19
	- Hamêd Bedirxan Arif Tislorî	32
	- Xwendîna zimanê Kurdî li Çiyayê Kurmênc û Reşît Hemo Pêkanîna : Pertewê Şerqî û Rozad Elî .	7
Çîrok :		
	- Helbesta Rengînê ... Merwan Berekat	25
	- Roj û ba ... Wergerandin ji Erebiê ... Mistefa Henan .	30
	- Mih û şer û gur ... Kovara Ronahî	31
Werger :		
	- Sirûda stranan a siltan Silêman . Salih Bozan	36
Helbest :		
	- Ax dilê min wax dilo Muruvet Cacim	40
	- Evîna Zimên Pertewê Şerqî	45
	- Ji yê bîrnabere Mihemed .Q . Hesen	46
	- Ez tim heme Nûşîn Bêcirmanî	48
Kelpûr :		
	- Ji gotinên bapîran	47
	- Pêkenok danehev M . Berekat	44

Www . Kovarapirs @ vahoo . Com .

Buha (50) L.S

Pêşgotin ..

Rênivîsa Kurmancî..

Li sala 1932an Celadet Bedirxan kovara Hawarê bi zimanê Kurdî û bi zaravê Kurmancî weşand, û gelek lêkolînên xwe jî di warê binyata zimên û rêzimên de xistin xeftandinê.

Pişt re, di salên pêncî û şêstiyên de ji sedsala bîstan, kesine din lêkolînên hêja di warê rêzimana Kurmancî de weşandin, mina: Kamîran Bedirxan, Qanatê Kurdo, Reşîte Kurd û hinên din.

Piştî wan, ango li dehsalên dawîn ji sedsala borî, gelek lêkolînvanên din jî li ser rêzimana zaravê Kurmancî xebitîn.

Lê digel ew xebata dûr û dirêj, gelek pirsgirêkên nivîsandina zaravê Kurmancî zelal nebûne û bê çareskirin man. Loma jî, li roja me, her nivîskarek yan li gor zanebûn û têgihîştina xwe dinivîse, yan jî li ser şopa rênivîsa lêkolînvanekî diçe.

Loma jî, dema ku mera rûpelên malperên Êntirnêtê vedike, mera rastî gelek pirsgirkan tê, û di nav şeweyên rênivîsê de winda dibe. Bi taybetî jî di mijara bihevxiştin û jihevkirina bêjeyan de. Wek nimûme: Dema ku bêjeya “jibîrkirin” bikeve rewşa kesandinê, gerek ew wiha “ji bîr kirin” were nivîsîn, lê mîna “ jibîr kirin” wer nivîsandin?. Bêjeya (vexarîn) jî, gerek e mîna “vexwaribûn” were nivîsandin, lê wek “vexwari bûn” be?

Bêguman pirsgirêkên mîna van, bi gerekî lêkolînên fereh in, lê belê pêwîst e biryara zimanî ya dawîn a “koreke zimanî” be, û eger gotin û guhertinek jî hebe, divê ya wê be.

Di vê demê de, ku hîn navendek û koreke zimanî ya rêzimana zaravê Kurmancî nehatiye damezrandin, em bawer in eger em li ser şopa rênivîsa Mir Celadet herin, û têrmên ku wî bi kar anîne bixebitînin, dê rastir be, û pirsgirêkên rênivîsa Kurmancî ta radeke bilind dê kêmbibin.

Ji ber giringiya vê lêkolînê û zimanê wê yê zelal û durust, me hêja dît ku em wê di kovara xwe de belav bikin. Û ji ber ku ew li gora kvara me dirêj e, emê wê li ser çar hejmarên kovarê belav bikin.

EM ZIMANÊ KURDÎ BINASIN

Amadekar:

Hasan Kaya
Zana Farqînî
Samî Tan

1/4

Destpêk

Li Rojhilata Navîn Kurd di bin serweriya çar dewletan de dijîn, ev dewlet jî Tirkîye, Îran, Irak û Sûriye ne. Zimanê fermî yê van dewletan Tirkî, Erebî û Farisî ye.

Zimanê Tirkî ji malbata zimanê ural-altay, Erebî ji ya Semîtîk û Farisî jî, ji ya Îndoewropî ye. Ji van zimanan tenê Kurdî û Farisî ji heman koma zimanî ne. Lê belê li vir tiştekî seyr heye. Hem rêveberiya Ereb û hem jî ya Faris hebûna Kurdan wek Kurd û zimanê wan jî wek zimanekî serbixwe dipejirînin. Lê nêrîna fermî ya rêveberiya Tirkîyeyê, vê yekê red dike û dibêje ku Kurd bi binyada xwe ve Tirk in.

Ev raman bi taybetî piştî damezîrana komarê serdest bûye û wek bîrdoza fermî hatiye parastin. Em dizanin ku, beriya komarê, Kurd wek qewmekî cihê û zimanê wan jî wek zimanekî serbixwe dihate dîtin. Ji bo nimûne, Evliya Çelebi di berhema xwe ya navdar ‘Seyahatname’yê de behsa zimanê Kurdî û zaravayê wê dike. Evliya Çelebi, dide xuyakirin ku zimanê Kurdî zimanekî dêrin ango qedîm e û ji zimanên mîna Farisî, Dêrî û Îbrî cuda ye.

Her wiha, Şemsettin Sami, di *Kamus’ül Alâm’a* xwe de û Ziya Gokalp jî di gotar, daxuyanî û berhema xwe ya bi navê ‘*Kürt Aşiretleri Hakkında Sosyolojik Tetkikler*’ê de, amaje dikin ku Kurdî bi tu awayî naşibe zimanên din û Kurdî zimanekî dewlemend û serbixwe ye.

Lê piştî avakirina komarê, nemaze bi qanûna bingehîn a sala 1924an, hebûna Kurdan tê redkirin, her kesê li Tirkîyeyê dijî mîna Tirk tê

pejirandin. Peyvên mîna Kurd, Kurdî û Kurdîstan, ku di gelek belgeyên fermî yê Osmanî û Tirkiyeyê de dihatin bikaranîn, têne qedexekirin.

Hemû zanyarên ku li ser zimanê Kurdî lêkolînên zanistî kirine didin xuyakirin ku, Kurdî zimanekî serbixwe ye û tu têkilî û pêwendiya wê ne bi Tirkî û ne jî bi Erebi re heye. Li hêla din, Kurd arî ne û ew û farisan lêzimên hev in, zimanên wan jî, ji heman koma zimên e. Lê her yek jê zimanekî serbixwe ye.

Ji mêj ve Kurdan bi zimanê xwe perwerde û hîndekarî dikirin. Li medreseyan li ser mijarên wekî matematîk, mantik, gramer, fiqih û hwd. perwerdehî bi zimanê Kurdî û Erebi dibû. Ev medrese piştî avakirina komarê hatin qedexekirin. Her wiha ligel vê yekê, weşan û nivîsandina bi Kurdî jî hatin qedexekirin.

Îro, rewş piçek guheriye, Wekî berê bi tundî înkara Kurdan û zimanê Kurdî nayê kirin.

Hejmara kesên ku vê yekê dikin, hindik e. Kesên statukoparêz, hebûna zimanê Kurdî qebûl dikin, ancax zimanê Kurdî wek zimanekî paşvemayî û cîgehî (mehelî) bi nav dikin û hebûna zarava û devokên di zimanê Kurdî de jî wek asteng li pêşiya perwerde, hîndekarî û weşanê didine nîşandan.

Rast e, di Kurdî de zarava û devok hene. Ev rewş, ne tenê xweserî zimanê Kurdî ye. Di hemû zimanan de zarava û devok hene. Standardbûn tenê di zimanê nivîskî de heye, ne di yê devkî de. Kîjan gel an netewe dikare biangiştîne (îdea bike) ku hem zimanê wan ê devkî û hem jî yê nivîskî zimanekî hevgiretî û standard e!...

Rewşa zimanê standard bi rewşa dewlet-netewe, dewleta modern ve têkildar e.

Dibêjin zimanê Kurdî, zimanekî têkilhev û col e. Tu kes bi awayekî zanistî nikare bibêje ku filan ziman xwerû û sade ye. Di hemû zimanan de peyvên biyanî hene. Ji bo vê rewşê em nimûneyeke balkêş li vir bidin. Di zimanê hemû gel û neteweyên misilman de serdestî û bandora zimanê Erebi berbiçav e. Her wiha di zimanê gelên îsewî de jî mirov rastî hîkarî û bandora zimanê latînî tê. Ev rewşa hanê ji ber ol û dîn e. Ji ber ku zimanê mizgeftê û Quranê Erebi û yê dêrê jî latînî ye.

Ji bilî vê yekê, hemû gelên cîranên hev ji ber sedemên cihê, ji aliyê zimên ve jî bandor li hev kirine û peyv dane hev û ji hev stendine.

Îro em bi awayekî zelal di zimanê Tirkî, Kurdî û Farisî de rastî peyvên Erebi tîn, her wiha van her çar zimanan ji hev û din peyv standine û dane hev. Ji ber ku wêjeya Farisî demekê gelên wekî Kurd, Ereb û Tirk ji xwe re hijmetkar hiştiye lewma jî peyvên wî zimanî ketine nav zimanê van gelan. Ev jî tişteki asayî û siruştî ye.

Kurd, gelekî dêrin ên vê herêmê (Mezopotamyayê) ne û xwedî şaristaniyeke zengîn in.

Ji pêşiyên Kurdan pir bermayî mane, ku hinek jê berhemên nivîskî ne. Ji belgeyên ku bi dest ketine, em pê dihesin ku Kurdan ji berê de nivîs bi kar anîne.

Belê, ev kitêbok ne li dû aşkerakirin û peyitandina wan tiştan e ku li cîhanê gelek pispor û mirovên sade jî pê dizanin. Lê ji ber ku di van demên dawîn de, li ser mijara zimanê Kurdî û Kurdan gelek gengeşî û hewlên berevajîkirina rastiyan pêk hatin û di van gengeşiyên de ne pisporên mijarê yên Kurd û ne jî saziyên wek enstîtuyê hebûn, ji lew re me pêwîst dît ku em bi awayekî puxtayî ji mijarên li ser zimanê Kurdî behs bikin. Em xwedî wê baweriyê ne ku, ev kitêbok dê bi kêr bê da ku gengeşî û nîqaş li ser zemîneke rast bên kirin.

Alfabeyên ku Kurdan bi kar anîne

Palpişt û belgeyên di dest me de, bi me bidin zanîn ku Kurdan bi dirêjîya dîrokê re gelek alfabe bi kar anîne. Lê belê em pê nizanin bê Kurdan serê pêşîn kîjan alfabe bi kar aniye û kengê dest bi nivîsandina nivîsê kiriye. Ji bilî alfabeyên ku em dê li jêrê bidin, Kurdan xetên aramî, suryanî û grekî jî bi kar anîne.

Alfabeyên ku heta niha Kurdan bi kar anîne ev in:

1) *Nivîsa Mixî*: Medan şeş (6) tîpên din jî bi ser ve kirine û hejmara tîpên vê alfabeyê ji sî û şeşan (36) derxistine çil û duduyan (42). Ev alfabe ji çepê ber bi rastê ve tê nivîsandin.

2) *Alfabeya Avesta*: Ev alfabe ji çil û çar (44) tîpan pêk tê û ji hêla rastê ber bi hêla çepê ve tê nivîsandin. Hin çavkanî destnîşan dikin ku, çil û heşt (48) tîpên alfabeya Avesta hene.

3) *Alfabeya Aramî*: Belgeyên herî kevn ên Kurdî bi vê alfabeyê hatine nivîsandin, ev belge li şikeftên herêma Hewremanê hatine dîtin. Her wiha tê gotin ku nivîsarên Kurdî bêhtir bi vê alfabeyê ne. Belgeyên

hatine dîtin, ku nivîs li ser çermê xezalan e, ji nav wan ên herî kevn ji salên 88-87an beriya zayînê ne.

4) *Alfabeya Berê ya Pehlewî*: Bi vê alfabeyê, bi navê ‘Dînkerd’ pirtûkek bi zaravayê soranî hatiye nivîsandin.

5) *Alfabeya Masî Soratî*: Dîrokzanê Ereb Ibn Wehşiye, di pirtûka xwe ya ku di sala 855an zayînê de qedandiye, dibêje Kurdan ev alfabe (Masî Soratî) bi kar anîye û sê (3) berhemên ku bi vê alfabeyê hatine nivîsandin jî dîtine. Ev alfabe sê û şeş (36) tîp bûne, lê Kurdan şeş (6) tîpên din jî lê zêde kirine.

6) *Alfabeya ku Kurdên Êzîdî bi kar tînin*: Bi sedan sal e ev alfabe ji aliyê Kurdan ve tê bikaranîn û ji sê û yek (31) tîpan pêk tê. Ji milê rastê ber bi milê çepê ve tê nivîsandin. Hinek kes ji vê alfabeyê re ‘Alfabeya Sirê’ (ango Huruful el Sîr) jî dibêjin. Pirtûka olî ya pîroz a Êzîdiyan *Mushefa Reş û Cîlwe* bi vê alfabeyê hatine nivîsandin.

7) *Alfabeya Erebî ya Kurdî*

8) *Alfabeya Latînî ya Kurdî*

9) *Alfabeya Kirîlî ya Kurdî*

Ji bilî van alfabeyan, li Hêrêma Zêwê ya Rojhilatê Kurdistanê, çav bi cureyeke nivîsê hatiye ketin ku li ser tepsîyeke zîvîn e. Li gor lêkolîneran, ev nivîs ji beriya zayînê (beriya mîladê) ji sedsala 8’an maye û ev nivîs aîdê medan e. Ji bilî vê belgeyê, li cihekî din kes rastî heman cureyê nivîsê nehatiye.

Enstituya Kurdî ya Stenbolê ..

www.enstituyakurdi.org

Xwendina Kurdî li Çiyayê Kurmênc..

Û

Reşît Hemo

**Pêkanîna hevdîtinê:
Pertewê Şerqî û Rozad Elî.**



Ne her rûniştinek rûniştin e, û ne her axaftinek jî axaftin e. Rûniştina bi mamosteyê hêja "Reşît Hemo" re, bi her tiştên xwe cuda ye, ew herdem şêrîn û bi sûd in, û bê ders û 'ibret hîç derbas nabin.

Kesayetiyeke mîna "Mamoste Reşît" hişmend, zana, rewşenbîr, siyastvan, gernas û bi ser wan tevan de, wî li dirêjîya temenê xwe herdem ji gelê xwe re dilsoz bû, kesayetiyeke wiha, bêguman cihê rêz û rûmetê ye, û berî her tiştî cihê guhdan û bihîstinê ye.

Me xwest di vê hevdîtinê de li ser destpêkiyên xwendin û nivîsandin bi zimanê Kurdî li navça Çiyayê Kurmênc rawestin, û em wê yekê ji mamoste "Reşît" bibîsin û wî jî çawa dest pê kir.

Mamoste "Reşît" ji zarotiye xwe de ji xwendinê hez dikir, û pir dixwast xwendina xwe bibe serî, lê mixabin xizaniya malbata wî û rewşên Şerê Cîhanê yê Duyemîn, rê li ber dilxaziyên wî birîn. Lê digel wê, xwandin bû sedema ku ew ji çarçewa gundîtiya teng derkeve û li dibistanên bajarokê Ezazê û bajarê Helebê demine kin, lê bi sûd û hikardar derbas bike.

Mamosteyê gewre "Reşît", ji destpêka jiyana xwe de bi xwendinê re têkildar bû. Li dema ku li seranserê navça Çiyayê Kurmênc deh kesan nikanîn (tîp naskirana), wê çaxê wî xocetî dikir, bi pirtûkan re dida û distand, û hîn jî wilo ye.

Mamoste "Reşît" li destpêka salên çelî ji sedsala bîstan, di warê fêrkirina zarokan de dixebitî û li gundên devera Reco mamostetî kiriye û bûye Xoce.

Li dawiya salên sihî û destpêka salên çelî ji sedsala bîstan, tevleheviyeke mezin li navça Çi.Kurmênc rabû bû. Li wan salan Tegera Mirûdan çek li dijî derebegên navçê û leşker û milîsên Firensa rakiri bû.

Ji bilî wê, şênîyê navçê di rewşeke nezanî û li şûnmayîneke giran de dijî, û toşî gelek dijwariyên jiyane yê giran dibû, wek nexweşî, birçîbûn, êşekên civakî.. û hwd.

Di wan rewş û deman de, kesên ku xwendin û nivîsandin dizanîn pir hindik bûn û li ser pêçiyên destan dihatin jimartin. Li wê çaxê, hîn zimanê Tirkî di nivîsandinê de bikar dihat, zimanê Erebî jî nû dihat xwendin û belav dibû. Lê belê nivîsandina bi zimanê Kurdî pir û pir hindik bû, piraniya xelkê nizanî, û belkî guman jî ne dikir, û ne jî dihat bîra wan, ku nivîsandina zimanê Kurdî heye, zimanê wan jî ne kêmî zimanên din e, û kanin pê bixwînin û binivîsin jî.

Em li gundê Hopka li hewşa mala Momoste Reşît, li bin dara Fistiqê rûniştin. Ew bi tena serê xwe li gund rûdine û dijî. Wî xwast mêvandariya xwe bibe serî, û bi dilxweşî û hezkirin rabû daku çayekê ji me re amade bike, lê me jê rica kir, û em rabûn me amade kir, piyalên xwe dagirtin û me ji mamoste "Reşît" pirs kir:

- Hêvîdar in tu li ser destpêka nasîna xwe bi xwendina Kurdî re ji me re baxivî.

- Li destpêka salên çelî ji sedsala bîstan ez li gundê Elî Bego-Reco xoce bûn û min zarok bixwedî didan. Rojekê çend cendime ji bo karekî hati bûn gund, û ji ber ku gundiyan bi zimanê Erebî nizanîn, ez bi wan re çûm ba cendirman. Di nav şoran re, cendimekî ji min pirsî û got: Ma zimanê Kurdî tê nivîsandin? Tîpên xwe hene?. Lê berî ku ez bipyivim, derket ku cendimekî ji wan Kurd e, wî bersiva da û wiha got: Belê... çawa! Mirovek li şamê heye navê wî "Celadet Alî Bedirxan" e, ew bi Kurdî dinivîse û koverekê bi navê ((RONAHÎ)) çap dike û belav dike. Wê hîngê min

navê Celadet ji wî cendirmeyî bir, û kir bîra xwe ku bi çî rêkê be, ezê xwe bigihînim Celadet û kovara wî.

Wê hîngê, mirovekî me li gundê me hebû, hîn jî xweş e, navê wî "Îbrahîm Qadir (Îbram)" e, wî jî ji pirtûkan û ji xwendinê hez dikir, dema ku ez vegehm gundê me, ez yekser çûm ba wî û min li ser gotina cendirme jê re got. Wê hîngê me biryar da ku em her yek namekê ji Celadet re bişînin û abontiya Kovarê jê bixwazin. Û herwiha me her yekê namek nivîsand, min bi zimanê Erebi, "Îbrêm" jî, ji ber ku baş bi Tirkî dizanî, bi zimanê Tirkî nivîsand, û me ew name şandin.

- We çawa navnîşana "Mîr Celadet" û Kovara Ronahî bi dest xist?

- Me navnîşan nizanî, loma jî hema me li ser naman nivîsand ((Şam- Celadet Alî Bediran)) û me ew avêtin postxanê. Xuya bû, ku li wê demê "Mîr Celadet" li Şamê mirovekî naskirî bû, loma jî name digihên destê wî, û wî ew dixwendin, lê belê ji ber ew yek bi Erbiyeke zelal û ya din jî bi Tirkîyeke zelal hati bûn nivîsandin, ew li wan dikeve gumanê, loma jî radibe ji "Şêxo Axa Şêx Smaîl", ku wê hîngê ji ber navça Çi.Kurmênc ve endamê perlemanê Sûrî bû, û ji kesê bi navê "Mecît" ji gundê Etmana- Reco bû li ser me dipirse, ew her du jî jê re dibêjin, ku ew me rind nas dikin, û dibêjin ew xortine baş in û guman li ser wan tineye. Wê hîngê "Celadet" du hejmaran ji kovara Ronahiyê ji me re dişîne. Piştî wê çend hejmarên din jî ji kovarê ji me re hatin û paşê hatin birîn û nema hatin.

-Sal tê bîra te?

- Ez guman dikim sala 1943 bû.

- Te çawa kanî bû kovara Ronahiyê bixwanda?

Min berê bi zimanên Tirkî, Firensî û hinekî Înglîzî jî dizanî, ango min berê tîpên Latînî nas dikirin, loma jî naskirina wan tîpan bi min hêsan bû, tîpên Kurdî yên dengdêr jî, min ew di riya bilêvkirina bêjeyan re nas kirin û hînê bûm, û herwiha ez hêdî hêdî fêrî tîpên Kurdî û xwendin û nivîsandinê bûm.

- Me ji mamoste "Reşîd" pirs kir, wê hîngê kesine din li navçê hebûn ku bi Kurdî dinvîsandin?

- Belê.. mîna ku ez dizanim, li salên çelî ji sedsala borî, kesekî bi navê "Mile Elî" ku bi navê ((Mileyê Zoyê Giran)) xwe dida nasîn, ((Mewlîdek)) bi zimanê Kurdî bi tîpên Erebi nivîsandi bû û çap jî kiri bû, û ew li boneyên olî dihat xwendin. Ez bawer dikim mirovekî din jî ji gundê Gemrûkê hebû, wî jî Mewlîdek bi zimanê Kurdî û bi tîpên Erebi nivîsandi bû.

- Mamoste, piştî ku tu fêrî xwendina Kurdî bûyî, te kesine din fêr kirin?

- Li wan deman, min di riya "Cemîl Kinê" re, ku berê li dibistana Reco mamoste bû, Nûrî Dêrsimî nas kir, "Cemîl" ez bi xwe re birim mala "N.Dêrsimî" û ez pê dam nasîn, gava ku "N.Dêrsimî" nas kir ku ez bi Kurdî dizanim bixwînim û binivîsim, ew pir şa bû, û ji min xwest ez dersên Kurdî jî bidim şagirtên xwe. Wî got: "Çi tiştên gerek û pere jî ji min, û fêrkin ji te", lê min jê re got: Ezê bê pere wî karî bikim, û wilo me soz da hev. Lê mixabin ji ber sedem û mercên li derveyê kanîna me, pirojeya me ne çû serî. Ew hevdîtî li sala 1945an bû, li wê salê Sûrya serbixwe bû, û rewşine siyasî yê nû peyda bibûn û bûn asteng. Lê belê li wê çaxê, gelek şagirtên dibistanan, ku li bajarê Helebê dixwendin, li ser destê "N.Dêrsimî" fêrî xwendina Kurdî dibûn, û dema ku ew li mehên havînê dihatin navçê, ez ji wan re dibûm vegereha zimên û min ew hînî xwendina Kurdî dikirin.

- Lê te kengî bi Kurdî nivîsand û di kû de diweşand.?

- Piştî wê demê, me di riya partiya Komonîst re helbestvanê Kurd Cegerxwîn jî nas kir, û me helbestên wî jî dixwendin, û herwiha em bêtir hînî xwendin û nivîsandina Kurdî bûn.

Wekî ku win jî dizanin, me li sala 1957an, Partî Demokratî Kurd li Sûryayê damezirand, navê belavokeka partiya me ""Dengê Kurd"" bû. Ew belavok li destpêkê du rûpel bûn û bi zimanê Kurdî bû, min û "Osman Sebrî" û "Dr.Nûridîn Zaza" mijarên wê dinivîsandin, pişt re demek hat min bi tenê çend hejmar derxistin, ji xwe paşê ew bi zimanê Erebi hat nivîsandin û çapkirin. Piştî wê, dema "kovara Gulistan" hat weşandin, min di wê de jî dinivîsand.

- **We di nav partiya xwe de, ji bo belavkirina xwendina Kurdî tiştêk dikir? We kesek fêr kir?**

Birastî em bi rêk û pêk di warê fêrkirina xwendina zimanê Kurdî de ne xebitîn, ez bawer dikim, ew jî ji ber gelek sedeman bû, jê: Mamoste û kesên ku zanî bûn karê fêrkirina zimanê Kurdî bikirana pir hindik bûn û bi hesanî peyda ne dibûn. Ya din, pirtûkên bi zimanê Kurdî jî peyda ne dibûn, belkî kirdeya herî giring jî ew bû, ku partiya me jî û her tiştêkî bi Kurdan û Kurdîtiyê ve girêdayî bû, ji hêla destlatê ve dihat qedexekirin, mirov li ser dihat girtin û zîndankirin jî, û ta niha jî wilo ye. Lê belê, bila em xwe bê guneh nebînin, partiya me ya wê demê, û belkî hîn jî hemî partiyên me wilo ne, tenê siyasetê dikin!! Û ti karên berçav di warên din de, wek fêrkirina zimên, ne dikir. Lê belê min li wan deman Alfabeyek amade kir, lê mixabin wê derfet ne dît ku di dema xwe ya lêhatî de were çapkirin, û herwiha li ser pelan ma.

Bi rastî mera ji dengkirina Mamoste "Reşît Hemo" têr nabe, her peyvek, ramanek, berkenek, livek û bîranîneke wî bi wate û nirxdar e, û tiştêkî ji civaka Kurdî li Çiyayê Kurmênc û dîroka tevgera û taybetmendîya mirovê Kurd û hêvî, daxwaz, sincî, nêrîn, çiya û banî... û cewherê mirovê Kurd salix dide û diyar dike. Ew mirovekî wiha ye, ku kurdîtiya sade û zelal bi ava kaniyên Çiyayê Kurmênc hatiye histiran û kesekî bi navê "Reşît Hemo" jê hatiye afrandin.

Li dawîya axaftinê, me spasiya "Apê Reşît" kir. Dîsa li ser tika me, me piyalên xwe yê çayê şuştin û me dîsa spasiya mamosteyê xwe yê qedirgiran kir.

*Gundê Hopka
Payîza 2009 an*

Pelek kesk ji dareke Efrînê weşiy a

(M. Norî Xorşîd, 1957- 2009)

Dr . Ebdilmecît Şêxo

Erê! Pelek kesk ji dareke berhemdar û bêhndar li Çiyayê Kurmênc weşiya. Sêwiyên bajarê me û evîndarên peyvên narîn xwe di bin sîtavên vê dara serbilinde, ji kîndarên mirovperweriyê diparaztin.

Lê niha dara me perdeyek xemgîn bi ser rûçkê xwe de berdaye , rondikên kesk ji pelên wê dibarin û stêrka Mihemed Norî Xorşîd li êvaran helbestên serxweşiyê ji dara bextreş re dixwîne.



Di siba roja 10.10.2009an de min û hevalê xwe Dr. Ehmed Ehmed û hevsera min Dilşan li dervayî bajarê Efrînê, li destpêka riya gundê Maratê- gundê Mezin bi dilêşeke kûr li çavnirîna termê nemir bavê Ceger dikirin û min bi kovanên tûj ji hevalên xwe re got; Di rastiye de herdem tete gotin ku kevir, hîm, rêk, newel, dar, kanî, perçeyên ji sirûştê ne û ciwan in, lê ew bê giyan û hest in. Lê na xanima min! Na hevalê hêca! Îro bi me re dîmena sirûştê jî tengezare , li derholên xwe temaşe kin, bibînin çawa darên zêtonan bi me re axînan berdidin, binêrin, çawa zikê rêkê ji êşê avis bûye, Xwedê zane çend salan bavê Ceger di ser vê rêkê re bi peya diçû û dihate

dibistana Efrînê, darên li kenarên vê rêkê tenê zanin, ku çiqas diltenikê me derdên sêwitiya xwe bi cegerxwînê ji qomriyan re distira. Em hîn ji hev re serxweşiyên bi çavên xwe dugihêzên, me dît pakrewanê me li ser piştê baskên çêrokek birîndar sîwar bûye, di nav girî û şînê de berê xwe daye nik balindên deng xweş û fireşteyên buheştê . Gava em gihane gundê Maratê , min dîsan gote hevriyên xwe , we dît çawa kevirên Maratê dinalin , hûn dengê girîna kaniya Maratê dibîsin ? ! Erê sirûştê me qencyên mirovên mîna dengbêjê êş û derdan, Norî , bavê Ceger jibîr nakin , eger hûn bawer nakin , bibîsin nemir çi gotiye û çiqas ewî ji gund û gundiyan xwe hez dikir (.....)

**Min ji her kesî
hawîrdora xwe hez dikir ,
min nizanî bû dilreşî çî ye,
ez mîna kaniyekê diherikîm,
ez evîndarê balind û gulan ,
û şadiyên bilbilan bûm.
Min ji hertiştî hez dikir ,
her tiştê li gundê min xweşik bû ,
bila ez bimrama ,
tenê min ji wir barnekira ,
ewa bûhşta min bû,
lê min ewa winda kir)**

(Werger ji zimanê Erebi)

Di ber xwendina van çend rêzikan re , em gihana guristana (Gundê Mezin) stêrên çavên me di qermîçekên rûyên me de bi hawar û giriyan keç û lawên nemir hatin meyandin .

Gava ku nivîskarê mirovperwer binax dikirin , hevalê min Dr. Ehmed bi min re got ; ez jî dixwazim hin gotinên hevalê xwe Norî hûnim bîra we, Norî di helbesteke xwe de lava kiriye ku ewa ne bi caw; sipî bête pêçan , lê tenê bi rojnaman , ewî jî helbestek ji me re xwend:

**Dê rojekê helbest min bikuje
Pêriyên helbestê
serdanek jar li min kirin
şeweyên tirsê ji min re destnîşan kirin
û gotin: Dê helbest
rojekê
di vê dema kevirî de
te
bikuje**

x x x

**Ne xeme
ku helbest min bikuje
belkî kuştina min ji we re jî
ne qisawet be
lê lavayek ..lavaaaaa yek
min heye ...!
li dewsa cawê sipî
min bi rojnaman bipêçin
pirtûkên min
bi min re têxin gornê
ta ku ewanan min mijûl bikin
axezê çawa di gorna xwe de
vê pirtûkên xwe bijîm ? !!!**

(Werger ji zimanê Erebi)

Mihemed Norî Xorşîd di sala 1957 an ji dayik bû ye , ew û belengaziyê ve cewî bûn ,di bin baskên bextekî setemkar de û bi tenayetî li gundê Maratê (Çiyayê Kurmênc) tev diya xwe Hizêranê dijîya .

Ewê xwendina xwe ya seretayî , navîn û sernavîn li gundê Maratê û Efrînê kuta kiriye , nemirê peyvên rastgo; lêsansê di zimanê Erebi de ji zanîngeha Helebê di sala 1984 an de werdigre û di pir dibistanên parêzgeha Helebê de mamosteyetî kiriye.

Du keç û pênc lawên rewşenbîrê zindî hebûn , hîn M.Norî. Xorşîd lingên xwe yên xwes , zikreşiyên derdora xwe jibîr nekiribûn ,

Kovara Pirs Hejmar 47 ... sal 2010 Rûpel - 14 -

perwînên buheştê giyana lawekî ciwan Rêzan li piştên xwe sîwar kirin û bi xwe re mîna çûkeke qeşeng û sazband birin nik bêgunehên jînê.

Bavê Ceger bi xwîna dilê xwe pirûkek helbestî bi navê (Balindê Bûheştê) di sala 2003 an de terxande kurê xwe Rêzan .

Çiqas M.Norî bi dilzarî û agirşewat helbestên xwe li tevnê dixistin , gilûgazinên xwe ji meriyên xwe dikirin , lê ewqas jî diltenk bû û di bin sîbera helbesta dilovan de hemû gunehên meriyên xwe di girava hezkirina xwe de şewitandin.

Hûn li kuderê bûn
Gava ez jar bûm
mîna segekî biçûk
bê sud
li pariyek nan digeriyam ?!
X X X

hûn li kuderê bûn
dema ez derbider bûm
tev firmêskên çavên xwe
pêxasî
dimeşîm
xûn ji dilê min diherikî
ji şerma tazîbûna guvdê xwe re
min serê xwe ditewand
ne xanî
ne xwedan
û ne jî siya darê hebûn ?!
X X X

Hûn li kuderê bûn
min rojekê nedît
hûn bi min re bûn
min tucarî ne dît
destekî dilovan
xwe dirêje porê min
yan destên min kir
û ez ji hejartiyê rizgar kirim
yan stêrên çavên min

paqij kirin
min tenê kînên we yên bê çav dîtin
para min ji we tenê zikreşî bû

.....)

Ey meriyên min
di wan rojên min
mîna sedsalan derbaz dibûn
xudêkê
hûn di bin kê de bûn ?
ne xem e , ey meriyên min !
tevî ku birîn mezin e
tevî ku setema we
weke şûrekî
bi ser min de dihat
ez ji dil de
li we diborînim !!!!

X X X

Min rojekê ji bavê Ceger pirsî , mamoste tu çima hemû derd û zamên xwe bi zimanê Erebi derdibirî ?

Ewê bi hêseke nazîk , gote min ; kek Mecît ! Bi biratiya me her duyan ez dixwazim bi zimanê dayika xwe binivîsînim , zimanê me weke şîrê dayikan şêrîn e, ez çî bikim , niha ez bêçare me, lê ezê mîna her kesekî niştimanperwer hewal bidim ku bi zimanê Ehmedê Xanî û Celadet Bedirxan binivîsînim , kek Mecît ! Tu zanî ez çiqas xemxwarê gel û welatê xwe me , ez dildarê civaka wekheviya gelan im , ka bibîne û bibhîse ! Navê dîwana min û navnîşana helbesta min ya yekem çî ye ?

Kînga ezê navê te eşker bêjim

Helbestvanê me bi serhilmîştî , bi kelgermî û hinarikên wî mîna gangilokan bûn, helbesta xwe ji min re xwend;

Ez te di dilê xwe de
vedîşêrim
ez newêrim navê te

eşkere bêjim
ez te di hevokê de
di sîmbolê de
di şanê de
vedişêrim
niwe li hawîrdora me
bi mij e
di serdema me de
wijdanên kesan
xew kirine !!!

X X X

Kînga ezê hestên xwe
yên zîndankirî serbest berdim
eşkere bêjim
ez ji te hez dikim
û sirûda xwe ya xemgînê
li pişt xwe bihêlim.....
(.....Kînga emê serketina peyvê
li ser bêdengiya sedsalan
û germbûna rojê
li zîndanên de
li darxînin ?
Ese
dê rojek were
ezê bi tijî devê xwe
ji te re bêjim
ez evîndarê te me.....
.....)

(Werger ji zimanê Erebi)

Min dîsan ji wî pirsî, tu kê yan çî di dilê xwe de vedişêrî ? Ewî gote min , ma rast tu nizanî ez Kurdistanê di dilê xwe de vedişêrim ! Min dîsan ewa hurhitand û gote wî, erê hevalo , xwaziya te ew tîrsa ji dilê xwe derxista !!!

Danûstandina me pir dirêj û germ bû , lê li dawiyê ez kanim bêjim ; Nivîskar M. N. Xorşîd bê sênor mirovhez bû , ewî bi qaserî kanîn û gengaziya xwe welatparêz bû, ewî mîna pisporekî zimanê Erebi , lêveger li sê , çar pirtûkên hevalên xwe kiri bûn ; mîna 1- Yelmez Gûney , 2- Efsane û serpêhatiyên Rojhilatê(Kurdî , E. M. Ş) yên hîlbijarte ji wergera Dr. Ehmed Ehmed .3- Gurzek gul ji helbestên zimanê kurdî ji wergera nivîsevanê vê gotarê (1995) .

M. N. Xorşîd di jiyana xwe de du dîwan 1-(kînga ezê navê te eşkere bikim ,1997) , 2- (Hezarê behuştê , - balindê behuştê- 2003) û pirtûkek ji çêrokan (Êşên Xorşîd , 2003) weşandin .

Lê pir mixabin, nivîskarê nemir nikanî bû di xweşiya xwe de çavên jin û keçên xwe bi du berhemên xwe yên ne çapkirî kil bidana , û ev herdu pirtûk li şûn wî mane 1-Dilê min û hêvê ve , ji kê re didagrîn -2- Ezê herdem helbestan biherikînim .

Piştî ku min di vê nivî şevê de, di êvareke bajarê Efrînê de, avceniyekek dijwar di gola bêzariya jînegerî û cîhana helbestên nemir de kir , ez kanim tenê ji giyanê M. N. Xorşîd re bêjim ; Erê, ne dilê te û ne jî hêva te kanîn ji kesî re bidagrîn , lê hemû hezkiriyên te , dê ji dil û hêva te re dilopan biherkînin, û bi helbestên te cavên xwe ziya bikin

Efrîn - 2010



Heyam li navça Çiyayê Kurmênc

"Efrîn"⁽¹⁾

Amadekirin:

Dr . Mihemed. E. Elî

Wekî ku tê zanîn, heyama her herêmekê bi kirde û endamên wê yên taybet ve girêdayî ne. Kirde û endamên bingehîn ku heyam pê tê afrandin jî ev in: Cîgeh û kendûkor, germahî, lihêm, ba, hilhatina rojê û barîn “baran, berf ...”.

Emê bi kurtahî li ser endam û kirdeyên heyamê li navça Çi.kurmênc baxivin.

1. Cîgeh û kendûkor:

Navça Çi.Kurmênc perçak e ji herêma Deryaya Naverast, ew di çarçewa navça heyama sarûgermî ya germ de ye. Sirtên Çi.Kurmênc jî ji çiyayên Sûryayê yên hundurîn tên jimartin.

Cihê tewir bilind li Çi.Kurmênc çiyayê “Girê Mezin” ku di ser bajarokê Bilbilê re ye, bilindiya wî digihê 1269/m e. Cihê tewir nizim jî di zikê Ge.Circim li ber sînore Tirkîyê li ber Gu.Merwanê ye, bilindî li wir dadikeve 85/m. Herwiha bilindiya navîn li Na.Efrînê digihê 675/m.

Li aliyê rojava jî, sirtên Çi.Kurmênc bi ser deşta Lêçe û Hêmqê de dadikevin, li rojava, li hemberê, Çi.Gewr/Amanos aso digire. Li başûr jî, sirtên Çi.Kurmênc bi deşta Cûmê bi dawî dibin.

Bi tevahî, sirtên Çi.Kurmênc ji bakur de berve başûr dirêj dibin, û hinekî xwe bi rojava de badidin.

Dûrbûna Na.Efrînê ji kendava deryaya Sipî de wek çavnêrîn 38km in, lê ew di riya deşta Hêmqê û bajarê 'Entekê re dora 80/km

¹ - Jêdera sereke: Pirtûka /Heyama Sûryê/, Dr. Elî Mûse.

ye. Û digel ku navberî di navbera Çi.Kurmênc û Deryayê de hindik e, lê Çi.Gewr ê ku bi bilindiya digihê 2226/m, û dora 100/km jî dirêj e, û ji 10 ra 20/km jî pehne, wek dîwarekî di navbera Çi.Kurmênc û deryayê de disekine. Wê lomê jî, pestên bê yên nizim, ku ji rojava de tên, li ber sirtên Çi.Gewr radiwestin, û berî ku bigihên Çi.Kurmênc, piraniya lihê û barana xwe li ser wî vala dikin. Loma jî, nizmepestên baranê yên giring, ji aliyê başûr rojava de di riya Kendava Iskenderonê re, û di derbenda Bêlangê re bi ser Çi.Kurmênc de tên. Ev rewşa xaknîgarî ya taybet, dike ku heyama Na.Efrînê, nîv ziwa û nîv lêhêmi be, li havînê germ û li zivistanê jî sar be.

Sirtên Çi.Kurmênc li aliyê bakur, ji ber sînorê Tirkîyê û bi başûr de, parve sê komesirtan dibin, ew hersê zincîrên sirtan di ber hev re dirêj dibin, û berekî başûr rojavaya distînin. Ev rewşa kendûkorî ya taybet, dihêle hikariya bayê deryayê, yê ku ji hêla başûr rojava de tê, bi hêsanî û bi qaserî hev derbas nav wan hersê zincîran bibe, li nav belav bibe, û bi qaserî hev jî baranê bibarîne.

2. Germahî:

Navîna pileya germahiyê li Na.Efrînê li meha Çele/Kanûn2, ango di dema herî sar de, digihê 3.9 pileyên sedane. Pileya germahiyê ya navîn jî di werzê zivistanê de, digihê 16.3 pileyên sedane. Navîna germahiya bilind di miha Tebaxê de jî digihê 32.3 pileyên sedane.

Ev e lîstek bi pileyên germahiyê yên navîn, di nîvê diduyan de ji sedsala bîstan, ku li çend navendên pîvana kirdeyên heyamê li Na.Efrînê hatine tomarkirin, /lîste 1/:

Navend	Meydan Ekbez	Bilbil	Efrîn	Mabeta	Reco	Şiyê
Pileya germê ya nizim/zivistan	4	3.6	3.2	3.7	4	4.3
Pileya germê ya bilind/havîn	33	33.2	32	33.5	32.5	33

Lîste -1- Pileyên germahiyê yên navîn li Na.Efrînê.

Ev jî lîstek e, bi hin nizimtirîn pileyên germahiyê li Na.Efrînê di sedsala bîstan de, /lîste 2/:

Sal	1950	1973	1989	1997
Pileya germê	-23	-17	-11	-18

Lîste -2- Nizimtirîn pileyên germahiyê li Na.Efrînê

3. Lihêm:

Bandoreke lihêmê ye giran li ser sirûştê heye. Serhejmar diyar dikin, ku navîna asta lihêmê li nivê diduyan ji sedsala bîstan li navça Efrînê %62 bû, ya herî bilind jî li mehên Kanûnê û Çile (%78) bû, ya herî dagerî jî li mehên Hezêran û Tîrmehê (%49) bû.


4. Ba:

Li werzê Havînê: Ji meha Gulanê de û ra meha Tebaxê, ba ji bakur rojava de bi ser Na.Efrînê de radibe. Leza bê nîvenîv e, û navîna wê 4.2/ mitir/se, leza tewir kêr jî di meha Tîrmehê de ye, û digihê 2.8m/s.

Li werzê Zivistanê: Herêma Rojhilata Deryaya Sipî, û Rojhilata Naverast bi tevahî, ji du jêderan de toşî bayê zivistanê yê sar dibin:

Yek: Ji bakurê Ewropayê. Ew li nivê diduyan ji werzê Zivistanê radibe, birûsk, baran, carna berfê jî bi xwe re tîne. Di wê demê de, guhertinên heyamê dirêj dibin û serma peyda dibe.

Didu: Bayê pir sar ji Sîbîriyayê tê, û dibe sedema peydabûna pileyên sermê yên pir nizim û awarte. Hebûna ew bayê pir sar li şevên sayî û hêmin li hin navçeyên Sûryê, bi taybetî jî li beşên wê yên bakur rojava, Çi.Kurmênc jî di nav de, rûdawa sirûştî ya bi navê “wergerîna germahiyê” çê dike. Bayê germ û sivik hildikşe jor, yê sar û giran jî dadikeve geliyan, zewran û cihên kort, û pileyên germahiyê li wan cihan digihên astên pir dagerî, bi wê yekê ziyaneke mezin digihê çandiniya deverên kort, nemaze jî darên zêtûn û hinarê. Guhertinên germahiyê yên wilo, çar caran di nivê diduyan de ji sedsala bîstan li navça Çi.Kurmênc çê bûne. Li sala 1989an bi deh hezaran darên hinarê û zêtûnê li deşta Cûmê bi sermê rewisîn. Li sala 1997an jî, bi wê sedemê 3.5 milyon darên zêtûnê li Na.Efrînê ziyar dîtin, /rojnama Tişrîn, hejmara 25.5.1997/.



Nexşe - Navça Efrînê û deverên wê.

5. Hilhatina rojê:

Hilhatina rojê ya rojane ya navîn di salê de digihê 8.3/ katan. Dema derhatina rojê ya herî kin /4.3/kat/roj di meha Çele de ye, ya herî dirêj jî di meha Tîrmehê de ye, ew digihê /12.6/kat/roj.

6. Barîn:

Barîn, ango barîna **baranê, berfê, zîpikan û Mij.**

- Baran:

Efrîn ji hêla baranê de ji navçeyên rawestiyayî yên yekê û ji nofa (B) ye li Sûryayê. Barana salê ya navîn 546.6/mm in. Kêmepestên bayî ku ji hêla Deryaya Sipî de tên, jêderên sereke ne ji barana navçê re.

Barîna baranê ji meha Êlûlê de dest pê dike, û li miha Çele digihê radeya xwe ya herî bilind. Barana Payîzê û Buharê gelek caran wek tavan, tev birûskan tê, û gelek caran ziyane digihîne çandinî û darûberan, û axa sirt û qeracan rêş dike.


Li navça Çi.Kurmênc, rêjeyên baranê ji rojava de berve rojhilat û ji bakur de berve başûr kêmtir dibe, sedem jî dûrbûna deverên rojhilat ji deryayê ye û dagerîna bilindiya sirtên çiyayî ji bakur de berve başûr ye. Ji xwe li cihên daristanî jî, tibaba baranê ji %10 ta %15 bilindtir dibe.

Ev e lîstek bi tibaba navîn ya barana salane li Na.Efrînê, li nivê diduyan ji sedsala bîstan, /lîste -3- û Xêzeşewe 1/:

Navend	Mabeta	Meydan Ekbez	Şiyê	Reco	Bilbil	Efrîn
Radeya baranê ya salane	655	648	630	615	585	455

Lîste -3-

Barîna baranê/mm li nivê duyem ji sedsala bîstan li Na.Efrînê.



Xêzeşewe -1- Bergeha tevahî ya barîna baranê li hin deverên Efrînê. /Amadekirin: Xalid Dîko/.

- Berf:

Bi tevahî berf li Na.Efrînê li ser sirtên ji 1000/m bilindtir dikeve. Ew bêtir li mehên Çele û Şubatê dikeve. Lê awarte jê re hene, wek li sala 1998an li 28 Adarê ket, li sala 2000î jî li 23 Tîşrîna Yekê barî.

Li zivistana 1910/1911ê, berfeke mezin li navçê û derdorên wê ket, wê li roja 30 meha Kanûna Yekê ya 1910an dest pê kir û ra 10 meha Şibata sala din ango 1911ê heroj dibarî, xelk wê berfê bi van navan bi nav dike: Çel berf, Berfa Reş, Berfa kûr. Li wê salê çemê Efrînê qerimî, mirov û dewarên xwe di ser re dimeşîn. Dîroknivîsê Helebî Kamêl El-Ğezzî li derbarê rewşa wê salê di pirtûka xwe de wiha dibêje: Hejmarine mezin ji Xezal, Gur, Heftar û Piling mirin û ji 600 sal de mîna wê berfê neketiye, li salên 1858an û 1878an jî dîsa berfeke wilo ket.

- **Zîpik** (hûr in) û **Tûlî** (girs in): Ew jî li navçê dikevin. Lê bi piranî ew li Payîzê û Biharê dikevin, û gelek caran ziyanê jî digihînin çandinî, rez û berê daran.
- **Mij**: Li katên sibê dikeve, carna pir giran jî datê û bergeha nêrînê pir kêmtir dike.

Kurteçîrok...



Merwan Berekat

Hevalê wê bi wê re got: Ji zû de, min dikir bi te re bibêjim, bingehke helbestvaniyê li cem te heye. Helbestî ji peyv û gotinên te difûre.

Ez nizamim tîrsa te ji bo çî ye, û ji bo çî, tu ji nûsandina helbestan dûr mayî.

Ez nizamim, ji bo çî tîrsê wêrekiya te di tûrkên xwe de veşartiye.

Hevala mina hêja, wek ji min ve tê dîtin, ez bawerim tu dixwazî helbestan binûsî, lê sedemên nenûsandina te ji helbestê re, ji min re ne diyar in.

Hevala mina Rengîn, jiyana helbestvanan taybetmendiyên xwe hene, û yek ji wan taybetmendiyên evîn e, û ez wê taybetmendiyê di çavên te de dixwînim, ez evîn û evîndariyê di her peyv û gotineka te de dibînim . Ez bawer im dema ku tu helbestan binûsî, helbestên te wê di asteka bilind de bin, ji ber evîndarî bingeha helbestê ye, û wek ez te dinasim ramanên te kaniyên evînê ne, û jiyana te ya rojane bi tîna evîndariyê dibore.

Dema Rengînê ew gotin ji Lezgîn bihîstin, dêmên wê yên gulgulî sor bûn, û fedokiyê di xwîna wan de sema kir. Rengînê çavên xwe di çavên Lezgîn de perwaz kirin, û di bêdengiyê de helbestên evîndariyê ji mishefa eşqê xwendin.

Tucarî Rengînê bi Lezgîn re negotiye ez helbestan dinûsim, lê Rengînê pir helbest nûsandine, ew ji tîrsa bav û birakê xwe newêre helbestên xwe eşkere bike, û ne jî wan ji kesekî re bixwîne.

Rengînê pir caran bi dehan helbestên xwe şewitandine, û pir caran jî, ji bo şewitandina helbestên xwe giriya ye.

Lezgîn gula di destê xwe de dirêjî Rengînê kir, û got: Ez bawer dikim ji îro û pêve tuyê helbestan binûsî, lê eger te nûsandin bila raman û wêrekî bi hevdu re ji pênûsê te biherikin, bila tîna nûsandinê ji hêmbêza pêxemberê wêrekiyê hêza xwe bistîne, divê tu ji siya tirs û newêrekiyê werî der, eger tirsê gulên ji seqema Buharê heba, ew venedibûn, geş ne dibûn, û ne jî bîn didan.

Ew konê ji tirsê, yê ku te li ser xwe vegirtiye, çitê wî biçirîne, û werîsên wî biqetîne.

Ramanên şaş yên kesên derdora xwe, ji xwe re neke Qisawet, û hin ji şîretên bav û birakê xwe wek qurneflên şevê birûçiqîne. Bila ramanên te azad bizên, û piştî zandinê, bila serbest bijîn.

Ne şaş e ... Na ne şaş e, eger carna tu xwe ji xwe vedizî, bila tu wek rengê xwe bêyî dîtin. Bêle zimanê pênûsê te bi zelaliya wêrekiyê peyvên di ser rûpelan de birjîne. Êdî bes e roj û dem di bêdengiya te de diqîrin.

Rengînê keserek kişand, û pênekê çavên xwe girtin, wênayên bav û birakê wê di ber çavên wê re çûn û hatin, carna jî gotinên wan li bîra wê dihatin, lê Lezgîn di axaftina xwe de berdewam bû, û wî digot: Hevbala nazdar ez di neynika dêmên te de bi sedan nameyên helbestvaniyê dixwînim, pêlên peyv û gotinên te li piştê hespên halbestvaniyê siwar in, her ahî û kesereka te navnîşana helbesteka tengijî ye, û her nêrîneka te sîmfoniyek e ji sîmfoniyên helbestvaniyê.

Ez bawer im rojekê helbestên te, wê bibin stiranên aşiq û evîndaran.

Rengînê bi hemû hestên xwe li gotin û peyvên Lezgîn guhdar dikir.

Gotinên Lezgîn ji Rengînê re bûn wek ava, ku guleka tî avde.

Rezgîn di hundirê xwe de geş dibû, tajanên wêrekiyê dil û cîgera wê vedizelandin, wê bi xwe re digot: Divê ez zincîrên tirsê biqetînim, û di cîhana wêrekiyê de bijîm.

Divê ez gotinên Lezgîn ji bîrnekim.

Divê ez bibime hevala pênûsê xwe, û ji wî nerevim.

Divê ez ramanên xwe ji zindanên tirsê azad bikim, û hestên xwe di bêdengiyê de lal nekim.

Belê... Wek Lezgîn dibêje rast e, ji ber dema ez biçûk bûm pîrka (dapîra) min bi min re digot: *Keça min Rengîna delal, wêrekî riya serkeftin û serfiraziyê ye, dema tu bi wêrekî bijî, jiyan xwe dike qurbana te, lê dema ku tu di pişt perda tirsê de bijî, tu dibî qubana her tiştekiê erzan.*

Rengîn rabû ser xwe , wê Lezgîn spas kir, gula di destê xwe de diyarî wî kir, li pişt hespê wêrekî siwar bû, û bayê şabûnekê berê wê daye mal. Renghînê li zengilê malê da, diya wê ji wê re derî vekir, Rengîn bi lez çûye oda xwe ya xwendinê, li pişt masê rûnişt û bi xwe re got:

Eger ez bi wêrekî li ramanên xwe yên helbestî xudî derkevim, ezê bibime helbestvaneka gewre, û pêşerojê ji min re bikene, wê serê pênuşê xwe ji zindana kumik azad kir, kutlek pelên sayî li ber xwe danîn, û serê xwe xist nav destên xwe, ramanan ew dûr dibir, û nêzîk vedigerand, hin peyv û navnîşan li ser rûpelan dinûsandin, lê carna şerekî pir giran di cihana ramanên wê de çê dibû, aliyek ji wî şerî gotinên bav û birakê wê bûn, û aliyê din jî gotinên Lezgîn û dapîra wê bûn, lê bêguman ramanên Lezgîn, û yên dapîra Renghînê bi serdiketin.

Rast e , ji her bûyerekê re, wêneyek heye.

Ji her ramanekê re, navnîşanek heye.

Di her navnîşanekê de helbestek heye, û di her helbestekê de mirovek heye.

Lê ne di her helbestvanekî de wêrekî heye, û ne jî her yekî deh bêje rêz kirin ew dibe helbesvan.

Roja din Renghînê tîlefûn ji Lezgîn re vekir, û ji wî xwest, ku hevdu li gulistana bajêr bibînin.

Lezgîn berî Renghînê gîhişte gulistanê, ew li pêşewaziya Renghînê çaverêbû.

Eşqa hevdişinê Rengîn bi lez gihande gulistanê.

Pêştî silav û xweşhaliyê, Lezgîn ji Rengînê xwest, ku helbestekê ji wî re bixwîne.

Rengînê got: Bi xwedê min ti helbest bi xwe re nanîne.

Lezgîn got: Ma qey tu nema helbesta dinûsînî.

Rengînê got: Belê min nûsandine, lê dema xwendina wan nehatiye, hema.. hema ez di destpêka nûsandina helbestan de me, lê ez bawer im di pêşrojê de, ezê gelek helbestên xwe ji te re bixwînim.

Lezgîn got: Belê Rengîn, em tev zanin, ku gul xwe bi stiriyan diparêzin, lê ez bawer im gula ku xwe pir biprêze, ew gelek bi bîne.

Wek her car Rengînê Lezgîn spas kir, û berê xwe daye mal, lê ev car ne wek her car bû, ji ber ku Rengînê biryar dabû, ku ew helbestan binûsîne, û ji Lezgîn re bixwîne.

Li dema êvarî Rengîn li ber maseyê rûnişt, hemû ramanên xwe yên helbestî guvaştin, wê helbesteka evînî bi deh rûpelan nûsand, lê berî helbestê bi dawî bike, wêneyê birayê wê di ber çavên wê re cû û hat, raste birayê wê xwende ye, lê nezan e, nûsandina helbesteka evînî bi pêûsê xwîşka xwe wek şermeke mezin dibîne.

Bavê Rengînê her û her weha bi wê re gotiye: Keça min, çûna nav civakê, û têkiliyên tewşende ne gerekê te ne, barê keçan barekî giran e, sinc di civakê de nemaye, serêşek bi min ne gerek e.

Diya Rengînê ji keça xwe hez dikir, û daxwaza wê ew e, ku Rengîn li gorî sincperestiya kurdan serbest û azad bijî, lê ew jî dîla şîretên bavê Rengînê ye.

Berî ku Rengîn pelên helbesta xwe ya evînî ji tirsava bav û birayê xwe biçirîne, gotinên Lezgîn û yên dapîra xwe bi lêv kirin, çengelê wêrekîyê ew ji gola tirsê revand, û ew di qonaxa xwe de rûnand, di wê pêû de, Rengînê bi xwe re digot: Rast e têkiliyên tewşende ne baş in, û parek ji civatê di gola şaşîtiyan de avjeniyê dike, lê ez bawer im ku têkiliyên min bi Lezgîn re ne tewşankî ne, û nûsandina helbestên evînî, ew jî ne dervî sinorên sincewariyê ne, ez bawer im, ku ez di asîmanekî sayî û zelal de difirim.

Ezê helbeta xwe bi dawî bikim, bila bavê û birakê min jî wê bixwînin, û ezê wê ji Lezgîn re jî bixwînim.

Berî tîrêjên rojê eniya çiyayên bilind ramûsin, nêrgêz ji sermestiya awazên bilbilan veciniqin, pinpinîk ji hêmbêza gulan derkevin ew xunavê berbangê ji xwe vepişkînin, û elend nîşana diyariya jiyaneke nû bide, Rengînê helbesta xwe bi dawî kir.

Berî ku Rengîn helbesta xwe ji Lezgîn re bixwîne, wê ji bav û birayê xwe re xwend, destpêka helbesta wê ev bû:

*Jin jîn e
Azadî ji wê re jîn e
Jiyan evîn e
Bê evîn jiyan kîn e
Yê bêje:
Jiyan bê evîn jîn e
Ez bawer im
Ew bêhiş û dîn e.*

.....
.....
.....
.....
.....
.....
.....
.....
.....

15 / 11 / 2009.

Cêrokeke Zarokan

((Roj û Ba))

Rojek ji rojan dibêjin ku Ro û Ba bi hev re ketin qerezan, gotin: Kaem binêrin kî ji kê bi hêztir e. Bê kir guvguv û got: ez bi hêz im û Royê got: na ez bi hêz im. Gotin, kanî em hunerên hev bibînin.

Bê dîsa kir guvguv, toz rakir, bapeşk rabû, dar hejîn û pel weşandin û bi pozbilindî ji Royê re got: Va te hêza min dît, ez ji te bi hêztir im!.

Roya ku tîrêjên xwe yên zêrîn berdabûn ser gir û çiyayên bilind, rûken bû û got: Bayo?!, te xwe pir dîtiye. Ez ji te bi hêztir im . Eger ji min bawer nakî, tenê li rûyê min mezeke, lê dîsa Bê got: Na ez ji te bi hêztr im. Royê jî Got: Na ez . Bê got: Ka Em binêrin, kî ji kê bi hêztir e?. Royê got: Bila be.

Bê got: Ew mirovê han, ê ku perdesûn li xwe kiriye te ew dîtiye? Kanî kî ji me kane(dikare) perdesûnê wî jê bike!

Bê dîsa kir guvguv û bapeşk rabû, hemahema dikir dar ji kokê de hilbibin, perdesûnê mêrik jî li vî alî diket û li wî alî diket, lê dihat hev û vedibû, lê her ku Ba bi hêz dibû, mêrik perdesûnê xwe bêtir li xwe daland û bernedida .

Ro kenî û gote Bê: Va ye te nikarî bû perdesûn jê bikira. Tu li min mezeke ez ê çawa bi hêsanî perdesûn ji wî dînim.

Royê tîrêjên xwe yên germ û bi tîn berdand, rûçik û canê mêrik bi tîrêjên xwe yên zêrîn germ kirin, xuhda û nikarî xwe li ber germa Royê bigirta, û daku xwe hênik bike, rabû pişkovên perdesûnê xwe yek bi yek vekirin, lê Royê hîn tîrêjên xwe gerimtir kirin, laşê mêrik jî sist bû, xuh di ser eniya wî re herikî, rabû perdesûnê xwe ji xwe kir, danî ser milê xwe û bêhneke vehesê ye kûr kişand...

Ro kenî, Ha... Ha... Haaaa. Ba jî di cih de fiş bû, rawestiya û bê deng ma...

**Wergerandin ji Erebi: Mistefa Henan
Ji pirtûka (Li dibistanê) - Çend Nivîskarên Rûsî**

Çîroka Kurdmancî:

MIH Û ŞÊR Û GUR

Çarekê êleke koçera bar kir. Mihek li şûn waran ma. Mihê jî rê girt û çû, rastî mêrgekê hat; mêrgeke pir xweş. Mihê jî tê de warê xwe çêkir û za; du berxên mê anîn.

Rojekê mihê dît vaye şerek bi ser de hat. Şêr jê re got: Tu çima li vir î?

Mihê got: Bi saya serê te ko tu siltanê heywana yî, ez û berxikên xwe li vir di vê mêrgê de diçêrin.

Şêr got: Qet tu hesaba meke ez li pišta te me, û şêr çû; mih jî ma.

Rojekê mihê dît vaye gurek hat. Gur jê re got: Ma tu nizanî ku ev mêrg ya min e û tu bêyî min hatiye û tê de diçêrî.

Mihê got: Ev mêrg, mêrga şêr e.

Gur got, na ev mêrga min e û ezê her dû berxên te bixwim, ji dêla çêriya xwe ve. Û rabû her dû ber xwarin û dîsa gote mihê: Careke din ez vegerim û te li vir bibînim ezê te jî bixwim.

Gur da rê û çû; şêr hat. Mihê hal û hewalê xwe jê re gotin. Şêr got: Meyzê, ezê xwe di pišta vî kevirê ha de veşêrim. Gava ku gur hat û gote te ev mêrga min e, tu bêje na ev mêrga şêr e. Heke got na mêrga min e; tu bêje hema sê gavan ber bi vî kevirê ha bavêje û bêje vî kevirî ev mêrga min e, min qebûl kir.

Rabû şêr xwe di pišta kêvir de veşart. Gur hat û gote mihê, hêj tu li vir î? Ma min ji te re ne got ji vir here. Mihê got, ev mêrga şêr e; wî got na. Axir mihê got, ji min re bi vî kevirî ha sûnd bixwe min qebûl kir.

Gur jî li tiştêkî wilo binêkar bû. Hema ber bi kevirê şû û got, ev gavek û du gav û sê gav. Li gava sisiyan çavê wî bi çavên şêr ketin, destê xwe avête pêsîra xwe û got: Bavo ez bextê xwe xera nakim, ev mêrga şêr e.

Çaxê wilo got, şêr ji pêl ve rabû û ber pê hat û jê re got: Belê guro ev bû mêrga min; ji ber ko te ez li pišta kêvir dîtîm. Lê te gava berxik xwarin ev ne mêrga min bû!. Şêr hema lepek li qafê gur da û gur di cih de kuşt.

Çîroka me çû deştê dê û bavên me çûn bihuştê.

Kovara RONAÎ- sal 1, hejmar 8, Şam 1942

Hamêd Bedirxan..

Tevahiya karnivîsên Erebî.. Helbest

Li navîna sala 2009an pirtûka bi navê ((Hamêd Bedirxan.. tevahiya karnivîsên Erebî.. Helbest)) hat weşandin. Ew di bin çavdêrî û serperştîya xanim Nazlî Xelîl de û bi pereyên wê hat çapkirin û wek diyarî hatin belavkirin.

Pirtûk ji 950 rûpelên ji pîvana standard pêk tê. Navnîşanên dîwanên ku di pirtûkê de hatin wiha ne: Tamara, Roj naçe ava, Mîriya, Berxwedan bi sîngên vekirî, Silavên min ji şervanên li çîyan, Sozê rezan, Komkujiya Helbçe û xaka Botan, Pêrhebok, Şiyê, Qêrîna zarokan, Şeva Hicranê-peşanê helbestî, Li ser rêçeriyên Asyayê.

Hamêd Bedirxan - Helbest û jiyana
(1924-1996)



Arif Tislortî

Piştî derbasbûna sêzdeh salan di ser mirina helbestvanê nasdar Hamêd Bedirxan re, emê ew helbestvanê Kurd ê hêja bibîr wînin, û jiyana wî ya dijwar û dewlemend, û çêroka wî bi helbestê re, û giringiya wî di warê tore de, û çawa helbest li ba Hamêd netenê pirsin ku dihatin nivîsandin bû, bidin ber çavan, û têkîya wî bi gundê wî Şiyê- Efrînê re bidin zanîn.

Hhamêd Bedirxan li sala 1924an li gundê Şiyê çavên xwe li dinya ronik vekirine. Navê wî yê resen û tevahî Hemîd kurê Mûradê Hesê Xidir e. paşnavê Bedirxan paşê ji hêla Celadet Bedirxan v diyarî wî bûye.

Berî şerê cihanê yê duyem, malbata Hemîd ji Şiyê barkir û çû li alioyê Tirkîyê bicih bû. Li wir Hamêd li dibistanê bajarê Entekê xwendina xwe ya destpêkî kir. Pişt re xwendina wêjeya Tirkî li zanîngeha Stenbûlê xwend. Hamêd berî bîst saliya xwe bi zimanên Tirkî û Firensî helbest dinivîsî. Li wan deman wî dostanî bi

helbestvanê Tirkiyê yê navdar Nazim Hikmet û yê Firensî Liwîs Eregon re danî. Lê belê li wan salan, dema ku li zanîngehê dixwend, ji baweriyên xwe yên siyasî yên çepgir ve, ji hêla asayîşên dewletê de hat girtin û xistin zîndanê.

Pişî ku Hamêd ji girtîgehên Tirkiyê hat berdan, li sala 1947an derbas Sûryê bû û li gundê xwe Şiyê rûnişt, wê hîngê ligel jina xwe Êmiş zewicî, lê zarok I wan re ne bûn. Li dirêjîya dora pêncî salî Hamêd ligel jina xwe di xaniyekî axî û bi qentirme de dijî, û rewş wî ya aborî ş jiyaneberî jî bi dijwarî derbas dibû. Dara Tûyê û ya Zenzelaqê ku di hewşa wî de bû, şahidên xemên wî bûn û pir birînê wî derman dikirin. Ew bi dengê xumxuma newala Circim şiyar dibû, û li ber ava kaniya Sebîlê ya zelal û li bin dara Zêtûnî li aştîyê û mirovatiyê dinivîsî.

Di hevdîtinekê de bi kebanîya Hamêd re li sala 2008an, wê wiha got: Hamêd bi şev ranediza, ew bi şevê re dijî, herdem dixwend û dinivîsand. Ê bi dengê dîkilê sipê re pirtûkên xwe dixistin bin çengê xwe û ş dev dida bajarî Helebê.

Hamêd Bedirxan bi çar zimanan zanî û helebest pê dinivîsand, Tirkî, Firensî, Erebî û Kurdî, H.Bedirxan dibistaneke toreyî damezrand, wî herdem pirsên welatê û hemî gelên bindest û qadên cefakêş û rêncber di sîngê rûpelên xwe de daniye.

Li salên dawîya temenê xwe, wî xwe rexne kir û got: min heya niha bi zimanê xwe yê zikmakî nenivîsiye, lê ez soz û birayê didim ku ezê dîwanekê bi zimanê Kurdî biweşînim, û herwiha piştî mirina wî, helbestên wî yên bi zimaê Kurdî di dîwanek biçûk bi navê Şiyê de hatin weşandin... Ev e çend malik ji perçehelbesta wî ya bi navê Şiyê:

Şiyê..

Kulîlkek ji gulistana welêt e

Gule, geş e..

Şiyê ye

Sînoren ronahî û tariyê ye

Av e

Ava kaniyê ye

Şiyê jin e mizgîn e..

Geh hişyar e
Tim dîn e
Bi birîne..!
Hilm e.. bîn e
((Birca belek a torevana ye))
Li ser rêka nemirinê ye
Buhîsta dilan daniye.

Ji perçe helbesta bi navê ((bîranîn)) jî ku ji bo 300 saliya ((Mem
û Zîna Ehmedê Xanî)) nivîsiye de jî wiha hatiyeÊ

Cana.. te bi min re rojekê gotÊ
Xeber bide ji çiyayên
Bi nav û nîşan
Ji çemên rengîn!..
Cana!..
Bi xêzên zêrîn hatin nivîsandin
Dêsim Metîn û Hemrîn..
Ağirî Îhsan Nûrî ye
Şahişahê çiya ye
Ala Kurdan girt şûna royê
Roya mîdî û azadî..

H. Bbedirxan di gelek kovar û weşanê Sûrî de bi Erebî dinivîsand,
wî endamê Yekîtiya nivîskarên Êrş bû jî, û gelek xelat ji hêla wan
de wergirtin.

Gelek dostên wî di nav nivîskarên Ereb de hebûn, ew dostaniyên
wî rta roja mirinê berdewam bûn, ji wan: Hene Mîne, Me'în Bisîso,
Elî El Cindî , Şewqî Bixdadî, Mîxayîl Îd, Necah El 'Etar.. û hin din
jî.

Di jiyana wî de du dîwanên wî bi Erebî bi derketin, yek bi navê:
'Ele Dirûb Asya (li ser rêçeriyên Asyayê), ya din jî Lelet El Hicran
(Şeva Hicranê)..

Ev in wergera çend malkên helbestî ji dîwanba yekê:
Her tişteke gengaz e
Çinkî zemîn freh e
Av jî dibin piran re diherikin
Û ez ta şeva zayînî jî
Li daristanê bi berazan re di tengahiya wî de me

Niha bi xatirê we
((ta em nebin djmin))
Çêroka jiyane wiha bu
Di qonaqekê de.
Ji diwana Leylet El Hicran ji:
Li çiyayên Dêrsimê!..
Çiqas ji bo Qudsa xemgîn dagirî
Û alên sor li serê sirtan hilgirt
Strana min -dirêj dibe- dsi ser deştan re
Piştî derbasbûnê
Ji derbendên çiyayî
Û ji rêçûnên çeman ên pehin
Ra deryan
Û paşerojê... .

Belê.. helbestvanê Kurd H.Bedirxan jî, mîna gelek nivîskar û helbestvanên ku ji koka xwe de Kurd in, wî jî pirtûkxana Erebi dewlemend kir, û digel ku ew yek bûye bûye cihê rexnê li ba hibek ji Kurdan, lê ew rastî tiştekî ji rastiya Krdîtiya Hamêd naguhêre

Berî ku Hamêd xatirê xwe bixwaze û ji dinya ronik bar bike, weseka xwe kiri bu ku wî li gundê wî Şiyê, li ser pesarê çiyayê kalikê wî çiyayê Hesê Xidir veşêrin.

Helbestvanê navdar Hamêd Bedirxan li roja 29.4.1996an jiyana xwe ji dest da, û bi rêwresmên zor balkêş û hêja ji hêla şêniyê Şiyê û berketiyên wî û yê wêje û rewşenbîriyê de cara dawîn hat vêrêkirin.

.....
.....
.....
.....
.....
.....
.....

**Wergerandin:
Salih Bozan**

PIRTÛKA PÊNCÊMÎN⁽³⁾

1. Dilyar: Ez hatim bihuşta xwe, hê xûşka min, bûka min, min murr û tiştên xweş beref kirin, min hingivê xwe teve şimayê xwar, min mey bi dewê xwe re vexwar.
(keçên Orşelîmê): Bixwin lo hogirno, vexwin û mest bibin lo evîndarno.
2. Dilber: Ez raketibûm lê dilê min hişyar bû, ax.. de bibihîsin! Va dengê dilyarê min e li derî dixe: Veke lê xûşka min, dilbera min, kewkirka min, çelenga min! Serê min bi xunavê şil bûye, û li ser guliyên min xûsî ketiye.
3. Min got: Min kerasê xwe ji xwe daniye, ezê ji ku careke din li xwe kim? Min nigên xwe şuştine çawa ezê careke din gemarî bikim?
4. Dilyarê min destê xwe di teqa derî re dirêj kir, bi vê tevgera wî re hestên min liviyan.
5. Ez rabûm bi destê xwe yê bîn jê dilop dibû, bi pêçiyên xwe yên bîn jê diweşiya, ez rabûm ji bo derbesta derî kaş kim.
6. Min ji dilyarê xwe re derî vekir, lê wax..., dilyarê min êdina çûbû, û derbas bûbû, û gava ew bi dûr ket, giyanê min ji hundurê min derket. Ez lê geriyam, lê min ew ne dît, min banê kir, wî li min venegerand.
7. Pêwanên di bajêr de digeriyan ez dîtîm, li min xistin, ez birîn kirim. Pêwanên surên bajêr jî cilên min ji min kirin.
8. Lê keçên Orşelîmê! Ez we sondkirin didim, ku win dilyarê min dibînin, nûçeyê min pê din ku ez nexweşim.
9. Keçên Orşelîmê: Lê çelenga jinan! Bi çi dilyarê te ji yên din çêtir e, ta ku tu me wisa sondkirin didî?
10. Dilber: Dilyarê min açix e û sor e, alek e di nav deh hezar peyan de.

² - Silêman: Navekî Cûdî ye (Cihûyî ye) bi wateya “peyayê aştiyê” tê. Ew kurê Şah Dawûd e, û şahê Cûdanî yê tewrî navdar e û bi şarezahiyê tê naskirin.

³ - Ew heşt pirtûk in, çar di vê hejmarê de, çar jî di hejmara berî vê de hatin weşandin.

11. Serê wî zêrî pak e, guliyên wî xarxarî ne û reş in, weke kelereşê.
12. Çavên wî mîna du kewên li ser gola avê ne, bi mêst şuştî ne û di ciyê xwe de rûniştî ne.
13. Gupên wî baxekî guldar e, bîna xweş jê tê, lêvên wî sosin in, xweşiya murrê jê dilop dibe.
14. Her du destên wî du bazinên zêrîn in, bi zebirced çinikirî ne û gewdê wî acekî dûz e, bi yakûtê hêşin keraskirî ye.
15. Her du çaqên wî du stûnên mermerî ne li ser du dezgeyên ji zêrî pak in, nigên wî mîna bilindiya Libnanê ne, ew ciwanekî mîna hevrestê bedew e.
16. Devê wî şîrin e, ew bi tevahî dilbijawend e, ev e dilyarê min, ev yarê min e lê keçên Orşelîmê.

PIRTÛKA ŞEŞEMÎN

1. Keçên Orşelîmê: Lê çelenga jinan! Ka dilyarê te kûda çû ji bo em bi te re lê bigerin?.
2. Dilber: Dilyarê min çû bihuşta xwe, çû nav gulên bîndar, ji bo di çîmenan de keriyê xwe biçêrine, sosinan berefke.
3. Ez a dilyarê xwe me, û dilyarê min ê min e, ew di nav sosinan de keriyê xwe biçêrine.
4. Dilyar: Lê dilbera min, tu çeleng î weke bajarê Tirs⁽⁴⁾, weke Orşelîmê, û heydedar î mîna leşkerên alên xwe jor de hildane.
5. Çavên xwe ji ser min rake, ew çiqas zorê li min dikine. Porê te weke keriyekî bizinan ji Cel'ad dadikeve.
6. Diranên te yê sipî mîna keriyekî miya ne ji bin şuştinê derdikevine, her diranek bi tacêwiyê xwe re ye, ti diranên pûç di nav de tinene.
7. Herdu gupên te di bin neftika te de du parçên henarekî ne.
8. Li wê derê şêst şahejin û heştê carî û keçên bê hijmar hene.
9. Belam di nav wan de, tu tenhayî ji gişkan çêtir î lê kewkirka min, lê ferzendeya diya xwe, ya di navbera zarokên wê de ya nazenîntir î. Keçîndaran ew ser xwe re digirtin, şahejin û cariyên ew dîtin û pesna wê kirin.
10. Va kî ye..? Weke berbangê derdikeve, weke hîvê bedew e, mîna hetavê hiltê, û weke leşkerên alên xwe jor de hildane heydedar e.
11. Dilber: Ez daketim baxçê gozan ji bo berên newalan ên nû bibînim, û ji bo ez binêrim ka rezan çiçek dane, û henar sor bûne.

⁴- Tirse: Bajarekî gelek çeleng bû, di bin destê Kenenayan de bû, Îzraîlan wêran kir, û paşê kirine bajarê xwe. Dibêjin ew nêzik bajarê Nablîsê bû.

- 12.Ji bo ku ez bizanibim çi dibe, min hew dît ku ez di nav mîrên gelê xwe de me, û ez ji wir reviyam.
- 13.Keçên Orşelîmê: Vegere ..vegere lê Şûlemîtê⁽⁵⁾, vegere.. vegere ji bo em li te binêrin.
- 14.Dilber: Win çi di Şûlemîtê de dibînine ?
- 15.Dilyar: Weke dîlaneke bi du rêzan e.

PIRTÛKA HEFTEMÎN

- 1.(Dilyar): Çendîn pêgên te bi solan bedew in lê keça mîran. Herdu hêtên te yên gilover du ciwahirên bi destên kirîdarekî jîr çê bûne.
- 2.Navika te piyaleke gilover e, zikê te gidîşeke geniman e bi sosinan dorpêçkiriye.
- 3.Herdu pêsîrên te du karên xezala ne.
- 4.Ustiyê te mîna acê dûz e, çavên te kûr in mîna du golên Heşbon in⁽⁶⁾, pozê te bilind e mîna birca Libnanê ya li Şamê dinihêrî.
- 5.Serê te weke Kermêlê ye⁽⁷⁾, û biskên porê te yên berdayî mîna erxiwana ne. Şah di van biskan de dîl kefî.
- 6.Çendîn tu çelengî lê dilberê, çendîn tu bi şahiyên şîrîn î.
- 7.Va bejna te mîna dara xurmê ye, û pêsîrên te weke guşiya ne.
- 8.Min got: Hele ez ji xwe re bi dara xurmê de hilperikim, bi guşiyên wê bigrim, bira pêsîrên te ji min re tirî be, û hilma devê te weke bîna sêvê ye.
- 9.Devê te meya tewir çak e!
10. (Dilber): Bila va gişkî ji dilyarê min re noşecan be, û ev meya li ser lêvên raketiyên de şêrîn birjê.
- 11.Ez a dilyarê xwe me, ew jî ji bo min disoje.
- 12.Lê dilberê were em herin hinda zevî, em li gundan rakevin.
- 13.Were em sibê zû herin hinda rezan, em binêrin ka çûçek dane, ka xunçeyên xwe bişkiwîne, henar sor bûne? li wê derê ezê evîna xwe diyarî te bikim.
- 14.Bîna mandragorê êdina diweşeye⁽⁸⁾, û fêkiyên xweş xwe bi ser deriyên me de berdane, fêkiyên kevin û nû yên min ji te re hilanîne.

⁵ - Şûlêmît: Navê dilbera di van sirûdan de ye.

⁶ - Heşbon: Navê bajarekî ye.

⁷ - Kermêl: Navê rîzek çiya ye li Palastînê.

⁸ - Mandiragor: Bi Erebi bi "Loffah" bi nav dikin, û bi latînî pê re dibêjin (mandragora officinarum). Mitekî weke patetan e û bîn xweş e, di wê demê de bawer dikirin ku ew mita derman e, jê nivîşt çê dikirin ji bo ku evîne di hundirê mirovan de peyda bike.

PIRTÛKA HEŞTEMÎN

1. Dilber: Xaziya tu birayê min ê pêsîra diya min mêtibûya, ji bo ku min tu li derve bidîta min kariba tu ramûsaya, bê ku kes min lomekar bike.
2. Min tu derbasî mala diya xwe bikira, ew dera ku diya min tê de min fêrî hezkirinê dike, minê meya bi ava henaran bi te da.
3. Destê wî yê çepê di bin serê min de ye, û yê rastê min hambêz dike.
4. Hê keçên Orşelmê! Ez we sondkirin didim win wî hişyar nekin, ji xew ranekin heta bi xwe radibe.
5. Keçên Orşelmê: Va kî ye ji çolê derdikeve, pala xwe daye dilyarê xwe?
6. Dilyar: Di bin dara sêvê de, li wê dera diya te bi te avis bû, bi êşên zayînê tu anî, li wê derê min sojên te ji te re hişyar kirin.
6. Dilber: Min li ser dilê xwe bi gustîlekê ke, li ser zendê xwe çînikê e, evîn weke mirinê bi hêz e, û gumreşî mîna kûristanekê zor e. Pêtên xwe ji pêtên êgir in, weke agirê Xwedê ye!.
7. Pîrbûna avê agirê evînê venamrîne, û ne lehî kare biniximîne. Ku mirov malê xwe bi evînê re bipîve, wê mal tim ji evînê kêmtir be.
8. Xûşkeke me ya bi çûk heye, hîn pêsîrên wê derneketine, emê di roja bûkatiya xûşka xwe de çî jê re çê bikin?.
9. Ku pêsîrên wê dîwarek bûya, meyê avahiyeke bilin ji zîv li ser lêkîra, ku deriyek bûya, meyê bi darên hevrestî piştvan bikira.
10. Dilber: Ez mîna dîwarekî me, û pêsîrên min weke du bircan e, loma di çavên wî de gîzorî me.
11. Rezekî Sulêmên li Bal Hamûn hebû⁽⁹⁾, rezê xwe da pasvanan ji bo berdêla berê wî hezar zîvî bidinê.
13. (Dilyar): Lê tu ya di bihuştan de rûniştî, herdu hevalrêyên min bi baldarî li dengê te guhdar dikine, ew dengê xwe bi min jî gihîne.
14. (Dilber): Weke bezokekî, bi lez were hinda min, bila tu mîna xezalan bî yan jî weke evorekî ciwan li ser çiyayê Etyab⁽¹⁰⁾!.

JÊDER

1. Pirtûka Pîroz: Çapemeniya Kambêrc – Ingiltera, bi zimanê Erebi, bê diyarkirina dem û çapxanê.
2. Pirtûka Pîroz: Wergerandina şîrove, bi zimanê Erebi - Kahîre-Misir-1988.
3. Pirtûka Pîroz: Komeleyên Pirtûka Pîroz li Rojaveyê Nêzik, bi zimanê Erebi- Bêrût-Libnan-1971.
4. Ferhenga Pirtûka Pîroz, bi zimanê Erebi. Bêrût-Libnan-1981.
5. Pirtûka Pîroz bi zimanê Rûsî, bê diyarkirina dem û çapxanê.

⁹ - Bal-Hamûn: Navê çiyakî bû, rezekî Silêmên lê hebû.

¹⁰ - Etyab: Navê çiyakî ye.

AX DILÊ MIN WAX DILO

Ax dilê min wax dilo

Ax dilê min wax dilo

Li ser kevirê sebrê dibêjim û dilorînîm

Çi maye tiştên ku te ji min ne birî

Çend heb tiştên bêxer mane ji min re

Yek çavekî bi hêsir u dilekî herikî

Çend bîraninên di nav mij u xumamê de mane

ji min re

Dem dibe şune me herduyan da ez digirîm

Ne dikarim evîneke nû biparêzê

Ne jî hevîdarîyeke mezin bikim

Dilê xweyê talankirî de

Cavên te dilê min kilîtkirîye

Dawîyên ku bê xwatirxwastî

Dawîyên bê hevîdar

Bê demsal ev cara çenda ye gelo

Pelê dara bendewarîyê weşîyan

Berf dibare bi ser hevîdarîyan de

Ji bo bîrvakirina te ne dem lazim e

Ne jî demên ku derbaz dibin têra bîrvakirina te dike

Ax dilê min wax dilo

Bese êdî bese were, were ji şevên minre bibe roj

Bê dengîya tarîya şevê wek xwenavê min dorpeçdike

Ji rikên şevên bê te de, sîhyate dinikute şevên dijwarde.

Ez lambên stêrka vedixim yek bi yek

Ji şevên minre dibin roj u bedena minre dibin germahayî

Wek germahiya te nabe; germahîya teye ku li ser singê min de



Muruvet Cacim

Ku bedena min dilerizîne rihê min dihellîne
Germahîya teye ku dibe agir alav li ser lêvên min
Min serxweş dike u bedena min ji xwere dest bi reksa kevnare dike

Ax dilêmin wax dilo
D1 bajarên wendakirî de
Di şevên serxweş de
Soz û biryara evînên nû didim
Kevirê sebrê dibe mermî di lûla dil de

Ax dilê min wax dilo
Min navê te nivîsî kuranîyên xwe de
Bilore dilê minê sêwî bilore
Ez tevnekê dihûnim bi hevî u xeyala
Û bi huba dilê xwe re dardixim
Bi jana dilê xwe re reng dikim tayên wê
Helboqe bi helboqan reng bi rengan
Wek hevidarîya dilên evîndaran
Rengek ji Kocgîrîya berxê min
Yek ji gelîyên Zilan
Hewarek li Helepce qerinek ji dila

Ax dilê min wax dilo
Şevan dirêj dikim wek kezîyên xwe
Xewnan dihûnim di kela dilê xwe de
Dilorinim bi bayên şevê re
Birûskan dineqîşinim ji rojê re
Dikim konê qedera xwe ya reş hilweşînim

Dîsa jî bê çare bê gîyan dimînim

Ax dilê min wax dilo
Ez şeverêşek im, tirêjên rojên jî xwe veşartine

Hew dertên li ser min, û rûyê xwe nişan min dikin
Kevirê sebrê jî dike kû biteqe

Ax dilê min wax dilo

Ne bi gotina Ahîdê ne bi ayetên Quranê
Sond û peymanan didim li ser vî canî
Dilê min parestgeha êş û jana te ye edî

Ez çiyakî bi rê û helûnek e bê çivîk im
Dilê min di derguşa hezar salan de dike ji nû de bijî

Ax dilê min wax dilo

Çima çima bedena min, rihê min û hisên min, bê gîyan ketine
Wendabûyîne ku paşva nayên şaşîyên ku çare lê nabin
U derdên ku derman nabin çima tev para min in

Ax dilê min wax dilo

Destekî ku nayê ditin, min dikşine melankolîyê û nava şeverşekê
Şingirtin bû şiklê jîyana min
Karekî ku ez bikim û evîndarekî minê ku ez lê bigerim jî tune
Car caran min hinek ji jîyana xwe avêtin
Hinek caran jî hinekan ez ji jîyana xwe avêtim
Demên buhurîn bi lez wek avê herikîn çun di ser min de
Di wan deman de ax di wan deman de
Min hinek nas ji pirtûka dilê xwe derxistin u avêt
Hinek nasên min jî bûn bîyanî
Ez tucaran wek niha bask şikesti bê qudum tenê û neçar ne bû bûm
Kevirê sebrê jî li ber teqandinê ye

Ax dilê min wax dilo

Fersah fersah berjerê jiyana xwe ya çuyî bûm
Jiyana bê gîyan jiyana bê armanç

Di kortikên çevên min de tîn xwarê wek şelala Miradyê
Ez di menzila kul û derdan de me îro dîsa

Ax dilê min wax dilo

Di ramana min de bîranînê perçe perçe wek neynika şikestî
Bîranînên min de zaroktîya min ciwantîya min hîç tuneke wenda ne
Difikirim ma ez çawa ji dayika xwe bûme ez waha bûm gelo
Jîyana min wek wêneke reş û sipî ye
Çima çima kesek min nabihîze û nabîne
Hewara dilê min nabihîze ku hatîye dawîya jîyana xwe
Ne femkirin, derd û xem, wendabuyîn û wendakirin ma tev para min
e

Kanî kanî rengên min yên din

Şîn pembe û gevezên min kûderê ne kanî keskê min
Li kuderê ne sor û zerên min
Ez bê qudûm im û naçar im lê dilê min û ramana min nû de dijî
U ji bo mirovatîyê rûmetê didim afirandin li cihanê

Ax dilê min wax dilo

Min dilê xwe û ramana xwe avête ser baskên teyran di deryakê de
difirin

Berbi rojeke azad ve dicin

Ey dilê minê bi kul û birîn, ey ramana mina ne çareserkirî

Herin herin selavên min ên germ

Ruh û canê min bibin ji welatê min re

Dema hun çûne li ser axa welatê ku bi salan tîn talankirin

Namûsên jinan tîn paymalkirin

Bedenê zarokan bi 13 de gulan tê xemilandin

Wek 13 de kahniyên xwînê diherikin di dilê min de

Wê demê ax wê demê hêsirên çevên xwe veşêrin

Axîna welatê min û germahîya dilê gelê min ji min re bînin

Da ku ez nû de bijîm

Da ku bikaribim evîna mezin bikim
Di dilê xwe yê çarperçe kirî de
Da ku ez bikaribim bi kurdî bikenim
Edî kevîrê sebrê jî teqîya
Ax dilê min wax dilo .

Mürüvet Y.Cacim .

=====

Pêkenok :

Mirovek çûye cem şêx , bi wî re got : Min di xewnê de
dît, ez li mêrgeka pirçawîr

(pîrgîha) rûnişti bûm, û kincina (çekna,cilna) sor li
bejna min bûn .

Tu çawa ev xewna min şirove dikî ey şêxê delal ? .

Şêx got : Bi xwedê ez bawer dikim ku, pêştî sêçar salan
tuyê bibî gayekî sor , û li ser mêrgan biçêrî .

Pêkenok :

Mamoste ji şagirt pirs kir : Navên sê ajalan ku ew di avê de
dijîn bijmêre, ?.

Şagirt got : Masî, bavê masî û diya masî.

Eîna zimên

Pertewê Şerqî

Ziman ...

Jiyan e

Şaristan e

Zanist e

Qîrîna zarokên şîrmêj ,

Û mendala ye .

Lorîna dayîk û hawara bavan e

Strana keç û xortên evîndar e

Zimanê sirûda pakrewna ye .

Ziman ..

Şana hebûna mileta ye

Nasnama mirov û pênasîna gela ye

Stûnê konê mayînê ye

Xwîna rehên netewî ye .

Ziman ..

Xemal û ala hebûnê ye

Divê ew xemil û al her li darbin

Jiyan di siya ala zimên de

Zelal jiyan e.

10 . 2 . 2010 .

Ji yê bîr nabe re

Mihemed . O . Hesên .

*Tu başîqê ji gulê re dixwînî
Lê dîkin
Dîwarê sipî hino hino hilweşînin
Ariya li şûna şûyên xelkên e
Di dehê çêriya pêşîn de¹¹
Zindê tu ji nav me veqetand,
Weke tenak genim
Di sîngê mandê de diçand
Kêrdûskên di destên şevê de
Dixwazin siba te vemirînin
Dil vekirin
Têde fener û heyv şînbûne
Darên zêtûnê li ber
Ronahiya xwîna te
Tenên xwe reş dîkin
Jê dihat
Sazekî kal nabe
Rengekî ji bîr nabe
Ji bîra
Çiyayê Kurdaxê
Yê ku di nav qûçê re
Serê xwe hil dide*

Ji yê bîr nabe re

14- 2-1995an

1. Di wê rojê de ji Payîza sala 1991an, mamoste Ebdilhemîd Zîbarî bi destên xinizên Kurd hat kuştin. (Pîrs).

Ji gotinên Bapîran

Roleke avê ye pir giring di jiyana mirov de, heye. Ew li ba gelek millet, civakan û şaristaniyan bûye tiştêkî zor nirxdar û pîroz. Ew di ola Zerdeştîyê de jî yek ji çar hêmanên pîroz e, ax û av û ba û agir. Zerdeştî jî ola Medên Kurd bû, û ra hatina ola Îslamî Kurd li ser ola bav û kalên xwe bûn, û her çar kirdeyên sirûştê pîroz dikirin. Loma jî wan kirdeyan, ra niha, bi kûran cihê xwe di agahî û baweriyên mirov û civaka Kurdî de girtin. Roja îro, gelek pend û şîretên Kurdî hene bi avê ve girêdayî ne, wateyên xwe jê dibin, û zanîn û baweriyên civakî şirove û diyar dikin. Emê niha çend pend û şîretên ku bi avê ve têkildar in hewaldin:

Av di Golan de dimîne digemire
Av di Golan de nayê xûyakirin
Av şûna nê nagre
Av di dîwêr re hilnakşe
Av dikeve xew lê dijmin na
Av ji dîwêr bilintir nabe
Av nedîtiye xwe pêxwas dike
Av dilop dilop kêvir qul dike
Av riya xwe dibîne paşê diçe
Av giyanê dide û giyanê dibe
Av û avahî duniyayê şên dikin
Ava bê deng bi tirs e
Ava bê pira mîna meriyê bê kes e
Di kevçiyek av de difetise
Ji ava bi ddeng metirse ji ava ker bitirse
Av di rûya de nema
Masiyan di ava herimî de digre
Avê çima deng ji te tê? got: Hevalên min kevir û kuç in.

Ez tim heme

Nûşîn Bêcirmanî

Ez padişahê xewn û ramanê te me
Gul pişktivî, îro li ser lêvê te me
Sînor herin, çiya herin, ez her heme
Çerx û felek tev ser te ne, hey dilberê

Bayê evînê hate min, sermest kirim
Bejna te min pîva bi çav, dil dîle tim
Agir dihat cerg û hinav, bê hêz kirim
Gera cîhanê bo te ye, ey meyerê

Sînga te xewna min civand roja bedew
Baxê te tim ware ji bo bilbil û kew
Bayê te hûnik tim dihat, ez ketme xew
Ronî te da , rengê te wek qozaqerê

Pora te reş bû wek şevê, sewdan firand
Rûyê te wek roja hilatî, şev çirand
Tîra ku hatî vî dilî, hêz zû şikand
Ev çûn û hatin bo te ye, lêv şekirê

Cîhan hemî wênek ji nav dêmên te ye
Kulîlk di nav de sor û zer rengê te ye
Yezdan çi dabû, gul jî tim rengê te ye
Pûçe pîlana şevê, wê zû herê

Cûdî û hemrîn dil revandin vê şevê
Namek ji lêvê hate min, min zû divê
Tim şiyar im bendî te me, nakim revê
Ez tim heme, naçim ji jînê, kî werê!!

Ez tim heme